# BULTENA ÇANDINIYÊ

### Buhayê Şîr ê Konseya Şîr a Neteweyî, Ne Buhayê Rençberan! Buhayê Sermayedaran e!

- Konseya Şîr a Neteweyî di meha adarê de lîtreya şîr wekî 5,70 TL diyar kir. Ji bo 15'ê Gulana 2022'an û şûnde dîsa buhayê lîtreya şîr wekî 7,50 TL diyar kir. Bi vê yekê erê kir ku rençber bi xizarî hilberînê bikin.
- Di meha nîsanê de buhayê kîloyek êm heta 7 TL zêde bû. Rençberên ku bi sewalkariyê debara xwe dikin, eger lîtreya şîr herî kêm bi 8 TL bê firotin dê xisarê nekin. Buhayê 50 kg êm ku herî kêm 350 TL ye, xebatên sewalkaran û sewalkariyê neyînî bi bandor dike.
- Saziya Şîr û Goşt (ESK), heqê serjêkarina sewalên îthal a karkasê 54 TL diyar kiriye. Ji bo serjêkirina sewalên xwecîhî jî ji 60 TL'yî derxistine 74 TL yî.
- Buhayê serjêkirina sewalên karkas a piyaseya serbest heta 100 TL'yî zêde kirine. Eger di bin baneyê ESK'ê de serjêkirina sewalan bê kirin, dê ji bo serê her sewalekê 2500 TL destek be dayîn û bi giştî serê kiloya goşt 84 TL be.
- Li gorî îstatîstîka Hilberîna Şîrê Xav a sala 2021'an a TUÎK'ê, di sala 2020'an de 23 mîlyon û 503 hezar û 790 ton şîrê xav hatiye dotin. Li gorî sala 2021'an ji sedî 1,3 kêm bû û 23 mîlyon û 200 hezar û 306 ton hatiye dotin.
- Di sala 2020'an de dotina şîrê bizinan ji sedî 5,6 dotina şîrê mihan jî ji sedî 3,9 zêde bû. Dotina şîrê çêlekan jî ji sedî 1,7, şîrê noginan jî ji sedî 0,2 kêm bûye.
- Wezareta Daristan û Çandiniyê, li gorî daxwaza sermayedaran (Komeleya Dermaleyên Pîşesazê Goştê Spî) destûr daye ku garis û 4 cûreyên soya yên sîsika wan hatiye guherdin di êmê sewalan de bên bikaranîn. Bi vî şiklî li Tirkiyeyê cureyê 21 garis û 15 cureyê soya hatiye guhertin. Bi giştî 36 cureyên nebatan ji bo xwarin û êmê sewalan destûr dane ku di êmê sewalan de bên bikaranîn.
- Wezareta Çandiniyê û Daristanê bi vê biryarê serdestiya li ser zexîreyan pêş xistiye û ewlehiya zexîreyan binpê kiriye. Bi vê yekê mafê civakê yê jiyanê jî binpê kiriye.

### Li şûna Mîlyar Dolarên ku li Kirîna Ji Derve Xerç Dikin, Divê piştgiriyê Bidin Rênçberan!

- Li gorî daneyên TUÎK'ê, yên gubreyê URE yê 2 mehên salê, gubreyê Ure yê di meha Çile de hat îthalkirin, di zikhevde buhayê tona wî 804 dolar e. Di meha sibatê de jî di zik hev de 795 dolar pere hatiye razandin. Di meha çile de 173 hezar û 744 ton, di meha sibatdê de jî 117 hezar û 843 ton gubreyê Ure hatiye îthalkirin. Welatên ku gubreyên Ure jê hatiye îxrackirin wiha ne; Misir, Libya, Ozbekistan, Turkmenîstan, Azerbaycan, Îran, Irak û Umman. Gubreyê URE yê di 2 mehên awî yên salê de tenê ji bo gubreyê URE nêzî 4 mîlyon dolar pere hatiye xerçkirin.

- Mîxtarê pemboyê ku li Tirkiyeyê di karê tekstîlê de tê bikaranîn 2 mîlyon ton e. Di sala 2021'an de ji 450 hezar hektarî nêzî 800 hezar ton lîfê pembû hatiye hilberîn. Di sala 2022'an de jî ji bo 550 hezar hektar zeviya ku bê çandin bi qasî 1 mîlyon û 100 hezar ton hilberîn tê payîn. Rekolteya pembû li gel ku li gorî sala par bêtir e jî dîsa têra pêdiviyê Tirkiye yê salane nake. Li Tirkiyeyê nêzî 1 milyon ton pembû, ji bo di qada tekstilê de bê xerçkirin, ji derve tê krîn.
- Li Tirkiyeyê di sala 2021'an de ji bo îthalata pembû nêzî 2,5/3 mîlyar dolar hatiye xerçkirin. Dîsa di sala 2021'an de ji bo çandiniya pembû ya li qada 1 dekarê bi 144 TL heqê mazotê dihat dayîn. Di sala 2022'an de ji bo hemaq qadê derket 440 TL'yî. Malîyeta gubre jî ji 260 TL'yî derket 800 TL yî.
- Li gorî lekolîna Turk-Îş'ê, di meha nîsanê de sînorê birçîbûnê yê malbata 4 kes lê dijîn, 5 hezr û 323 lîra bû. Sînorê xizaniyê jî 17 hezar û 340 lîra bû. Lêçûna xwireka sereke ya herî kêm ji bo malbata 4 kes lê dijîn, li gorî salek berê ji sedî 8,02 zêde bûye. Piştî 12 mehên dawî niha gihiştiye ji sedî 85,02'an.
- Li gorî daneyên endeksa meha nîsanê ya buhayê zexireyê kurevî ya FAO'yê, li gorî meha nîsana 2021'an ji sedî 29,81 zêde bûye. Li Tirkiyeyê di meha nîsanê de enflasyona zexîre ji sedî 89,10 hatiye hesapkirin. Cudabûna reqamên enflasyona zexîre ya Tirkiyeyê û reqamên enflasyona zexîre ya kurevî, her ku diçe zêde dibe.
- Ofîsa Berhemên Axê (TMO) di 29'ê Nîsanê de ji bo îthala 480 hezar ton genim, 2 îhale dan.
- Dolmîşa karkerên demsalî ku ji Rihayê diçû Kutahyayê, li Eregliyê teqil bû û 12 karkerên demsalî birîndar bûn.

**Hin berhemên çandiniyê yên bingehîn û rêjeya zêdebûna buhayê wan**

| Berhem Kg | Buhayê zeviyê | Buhayê Hala Mêrsînê | Buhayê Hala Stenbolê | Buhayê serfxwir | Buhayê serfxir ê meha borî | Buhayê serfxwir ê salek berê |
|---|---|---|---|---|---|---|
| Îsot | 6-9 TL | 10-30TL | 10-35 TL | 15-50 TL | 30- 50 TL | 10-15 TL |
| Firengî | 2-8 TL | 4-20 TL | 15- 40 TL | 30-50 TL | 20-45 TL | 5-15 TL |
| Kartol | 1-3 TL | 2-9TL | 8-13 TL | 5-25 TL | 8-16 TL | 1-5 TL |
| Pîvaza hisk | 0,25-5 TL | 2 -10TL | 2-8 TL | 3-15 TL | 5-15 TL | 1-4 TL |
| Bacan | 3-10 TL | 4-22 TL | 10-22 TL | 15-45 TL | 32-40 TL | 5-12 TL |
| Sêv | 2- 7 TL | 5 -15 TL | 8-15 TL | 12-25 TL | 15-25 TL | 4-10 TL |
| Pirtuqal | 0,25- 2 TL | 1-4 TL | 3-7 TL | 9-20TL | 3-12 TL | 5-8 TL |
| Hirmî | 2-8 TL | 3-15 TL | 5- 20 TL | 15-30 TL | 12-30 TL | 5-13 TL |

Nîşe: Buhayê berhem, li gorî lêçûna zêdekan û qalîteya wî-ê tê guhertin.